Justiz- und Sicherheitsdepartement des Kantons Basel-Stadt

**Generalsekretariat**

▶ **Gewaltschutz und Opferhilfe**

## Çavdêriya elektronîkî ji bo parastina li hemberî tundî, gef û şopandinan

Ji bo ku li hemberî tundî, gefxwarin an şopandinên ji aliyê kesekî diyar ê hokara pêkanîna xeterê bi awayekî baştir werî parastin, tu dikarî li gorî Xala 28b ya Qanûna Sivîl (ZGB) ji dadgeha sivîl daxwaz bikî ku ev kes ji bo heyameke diyarkirî ji nêzikbûna li te û / an jî danîna têkiliyê bi te ra were qedexekirin. Tu dikarî ji bilî vê yekê, li gorî Xala 28c ya Qanûna Sivîl (ZGB) ji Dadgeha Sivîl (Medenî) bixwazî ku kesê/a wek hokara pêkanîna xeterê ji bo ketina bin çavdêriya li ser vê qedexetiyê, şandereke elektronîkî bi xwe va hilgire. Kesê/a di bin çavdêriyê da renge were neçarkirin ku di mesrefên vê çavdêriyê da pişk û para wî/wê hebe.[1]

### Çavdêriya elektronîkî çawa dixebite?

Şandereke li gozeka piyê kesê/a ku divê çavdêrî li ser wî/wê were kirin, tê girêdan. Ev şander bi riya GPS'ê radigihîne ku ew kes kengî li ku ye. Her wiha eger ev şander were vekirin an desttêderwan tê da were kirin, radigihîne. Di navbirên demî yên rêkûpêk da (ne bi awayê kêlîkî) tê çavdêrîkirin ku gelo kesê/a têkildar qedexetî binpê kiriye an na (Xwedîbergiravî "Çavdêriya passive"). Babetên binpêkirinê piştra dê werin dîtin. Pêkanîna têkilî û pêwendiyên qedexekirî bi şêwazên ne-fîzîkî (bi riya telefona destan, WatsApp, telefon, Email, Name) nikarin bên têderxistin.

### Çavdêriya elektronîkî çawa min diparêze?

Çavdêriya elektronîkî misoger nake ku kesê/a di bin çavdêriyê da sozdarê qedexetiya têkilî û lênêzikbûnê bimîne. Helbet eger ew kes sozdarê qedexetiyê nebe, rayedarê dê vê yekê (piştra) bibînin. Bi vî awayî selimandina vê mijarê pêkan dibe ku babeteke binpêkirina qedexetiyê qewimiye û ev yek li ku qewimiye. Çaverêtî heye ku ev yek ji bo sozdarbûna kesê/a wek hokara pêkanîna xeterê derheqê qedexetiya têkilî û nêzikbûnê alîkar be.

### Di rewşa binpêkirina qedexetiyê da dê çi biqewime?

Babeta binpêkirina qedexetiyê piştra dê were dîtin (xwedîbergiravî "Çavdêriya Passive"). Di dema ku rayedar binpêkirina qedexetiyê dibînin da, kesê/a wek hokara pêkanîna xeterê pirrî caaran dîsan ji cihê qedexekirî dûr bûye. Ji ber vê yekê polîs *nayê* haydarkirin, jin ber ku binpkirina qedexetiyê pêştir qewimiye û êdî nabe ku polîs pêşî li vî karî bigire. Eger rayedar binpêkirina qedexetiyê li sîstema çavdêriyê bibînin, ew ê babeta binpêkirinê di heyama çend rojên karî da ji Dozgerî û Dadgeha Sivîl ragihînin. Dozgerî dê ji bo kesê/a di bin çavdêriyê da cezaya pere bibire. Her wiha Dadgeha Sivîl dikare li ser daxwaza te, eger şert û mercên pêwîst hebin, çavdêriya elektronîkî dirêj bike.

### Gelo ez ji binpêkirina qedexetiyê haydar dibim?

Tu yê di heyama çend rojên karî da ji babetên binpêkirinê werî haydarkirin (Kopiya raporê bo Dozgeriyê). Eger naxwazî ku haya te ji babetên binpêkirinê hebe, tu dikarî vê yekê ji Dadgeha Sivîl ra bibêjî.

### Eger ez hesta ewlehiyê nekim, ez ê bikarim çi karekî bikim?

Di her demekê da di gel hejmara têkiliya awarte ya 117 bi Polîs ra bikeve têkiliyê.

### Eger ez li dû piştgiriyê bim, ez ê serdana çi kesî bikim?

Li kantona bajarê Baselê gelek xizmetên piştgiriyê li ber destê te ne. Di karta rewşa awarte da hemî navendên pisporî û taybet ku tu dikarî serdana wan bikî, hatine nîşandan.

- Karta rewşa awarte li vir heye: https://www.bs.ch/themen/sicherheit-und-demokratie/gewalt/haeusliche-gewalt/infomaterial-deutsch-und-fremdsprachen

---

[1] Bingehên qanûnî di asta federal da: Xala 28b û 28c yên Qanûna Sivîl (ZGB): https://www.fedlex.admin.ch/eli/cc/24/233_245_233/de (Dîroka Çileya 2022an)
Bingehên qanûnî di asta Kantonê da: Rêziknameya têkildarî çavdêriya elektronîkî ji bo parastina kesên ziyandîtî ji tundiyê (SG 212.191): https://www.gesetzessammlung.bs.ch/app/de/texts_of_law/212.191 (Dîroka Çileya 2022an).

- Opferhilfe beider Basel (Alîkariya bo goriyên du ya Baselê) di warên civakî, maf, derûnnasî, bijîşkî, babetên teknîkî yên bîme û aboriyê da şêwirînê raber dike: Tel. 061 205 09 10, www.opferhilfe-beiderbasel.ch